JANÊN JINEKÊ

Xalib Cemîl

Ew jinika he li spêdehiya li serê kolanê diraweste.
Dibe peykerekê zindî û kerba xwe bi cadê de dirêje.
Spiyatiya destên xwe di nav hişka de vedişêre
Heku ba pirça wê dibe sîtavka serekê mezin.
Sîberê li singê wê dike,
mêyatiya wê dibe gumbeta bajêrî û şermê ji hebûna xwe dike
Di gel kêşana henaseyên havîbûnê hêvîyên wê dibine havîna enfalan
û
li ber bergehê mizgefta xwestinê dike
Ew jinika he heku bêriyên ji vana dihênê
Tif dike jiyanê û jehra janiyên xwe dadihure
Dibe tevinpîrkeka tirsiyayî û di qulaçên ji wên tarî ve
Xwe di gel tevnê xema diçêçe
Êvara xewnên wê yên xav teviyeka peyvên şaîrêne
li esmanê jora wê dibarin
Çavên wê yên ji dîtina westiyayî pêlên poşmaniyê baweriyên wê dikin dûkêl
Li vî serdemê
xwekuştinê û xwarina xwînê
Xweziya wê
Dibe leûekê rûs û ramanên eşqê vedişêrin.